

# Cruz di "Hembêz kirinên şikestî" de

» RÛPEL 9



Çand û Hûner

# Firotina epirtûkan rekor şikand

» RÛPEL 8



Zanist

Versiyona çapkiri ya HAWAR NET.comê / Çapa Dijital / 05.01.2010

Hejmara 2

Rojnameya Kurdî a serbixwe

hawarnet.com

pesketin@hk-mg.net

# Pêşketin



## "Dê çekên nuklerî bêne kêr kirin"

Wezîrê derve ya Rûsyayê diyar kir ku Sergey Lavrov bi peymana STARTê ku bi DYE re were îmze kirin wê bibe sedema kêr bûna çekên nuklerî. » rûpel 7



## Gelo şerê bi El-Qeîde de cepheya nû Yemen e?

Emerika û Britanya Balyozxanên xwe li Yemenê girtin. » rûpel 6

Di 2009'an de muzîka Kurdî » r.8

Serokê YE'yê a dewra nû edî Spanya ye » r.7

Di nav salekê de 1000 ciwan tevî Gerilayan bûn » r.7

Rewş gellek xerab e, lê em dikarin çi bikin? M.Nureddin Yekta » r.6

Kêmasiya vîtamîna D rîska krîza dil û mêjiyê zêde dike Dewama nûçeyê di rûpela 8'an de

# Doh Helebece, Îro Kelebce!...

- Nerazîbûnên li hemberî operasyona li dijî BDP'ê ya ku li 10 bajaran hevdem pêk hat û di endcamê de 7 jê şaredar 49 siyasetmedarên kurd hatin girtin didomin.
- Li dijî îradeya gelê Kurd, helwestên qirêj ên dewleta Tirk her diçe zêde dibin.

Amed (Pêşketin): Bertek û şermazkirina derxistina Dadgeha Amedê ya 36 kesên bi kelepçe, li billboardên şaredariyan ji hatin daliqandin. Piştî saziyên sivil ên li Êlihê afîşên "Em şaredarê xwe dixwazin" li billboardên bajar daliqandin, Rêxistina BDP'ê ya Amedê ji wêneyên 36 siyasetmedarên kurd ên bi kelepçe yên bi nivîsa "Duh Halep'çe, Îro Kelebçe" li billboardên bajar daliqandin

Zordariya "îfade dayîne" a dewleta Tirk dewam dike

Li dijî îradeya gelê Kurd, helwestên qirêj ên dewleta Tirk her diçe zêde dibin. Polêsên ku bi ser navenda BDP'ê de girtin, serî li rêbazeke ecêb û dijdemokratîk dan. Polêsên sivil li navenda giştî ya BDP'ê, li parlamenterên kurd geriyên. Balkêş e ku ev kirina qirêj piştî civîna MGK'ê ya pêr pêk hat. Ahmet Turk, diyar kir ku qirîza îfadeyan bi zordariya xala 14'emîn a Makeqanûnê hatiye ve astê û wiha got: "Di demek munasib de em dê biçin îfade bidin." Turk ji bo 3 parlamenterên BDP'î ji anî ziman ku ew ê neçin îfadeyan nedin.

Dewama nûçeyê di rûpela 4'an de



Hêrsa Kurdan hemberî wan dîmenan di asta herî bilind de ye



Berfê Kurdistanê girt bin bandora xwe... R4

## Pêşmergeyên Kurdistanê dibin xwedîyê çekên giran

Artêşa Kurdistanê Federal ji bo avakirina ordiyê modern gava pêşî davêje. » r.3

### Îtifaqa kurdan û Roja Mehşerê

ROJGIRAV AMED

Bila gelê me yê başûr ve yekê baş fêm bike ku yê bi wî re dijîminahî bike... Dewama nûçeyê di rûpela 2'de

### Gelo di dorê de Japonya heye?

Deynê kamûyê a Japonyayê serê hikumeta Japonyayê diêşîne. Dûmahîk di rûpela 2'de

### Di 10 salan de 10 kifşên girîng

Di deh salên dawî de gelek keşîfên dirokî pêk hatin û di jiyana mirovan de guherîn çêkir. Dewama nûçeyê di rûpela 4'de

### Giranî li her derê cihanê ne eynî ye!

Peysa Goce a Ajansa fezayî a Ewropayê dever dever nexşeya kêşard a rûyê erdê derxist. R8

Naveroka Din

» Gotar r.5-6

» Zanist r.8

» Aktuel r.10

Erkên medyaya Kurdî û kêmasiyên bingehîn  
SERHAD B.RÊNAS

Dewlet û Konfederalîzm...  
MAMOSTE MARÛF

Siyaseta Kurdan Felaketa Zimanê Wan e!  
M.YEKTA

Weşanên HKMG:

HAWAR NET hawarnet.com  
MUZIKKURD muzikkurd.com  
SINEMAKURD sinemakurd.com  
ZANISTUTEKNOLOJİ zanistuteknoloji.com  
KURDO kurdo.me | JINANE jine.hk-mg.net  
ABORINAS aborinas.hk-mg.net  
HEMÎ: www.hk-mg.net



# Nerazîbûnên Kurdan dewam dike

Nerazîbûnên li hemberî operasyona li dijî BDP'ê ya ku li 10 bajaran hevdem pêk hat û di encamê de 7 jê şaredar 49 siyasetmedarên kurd hatin girtin didomin.

**AMED (Pêşketin)**

Bertek û şermazkirina derxistina Dadgeha Amedê ya 36 kesên bi kelepçe, li billboardên şaredariyan ji hatin daliqandin. Piştî saziyên sivil ên li Êlihê afîşên "Em şaredarê xwe dixwazin" li billboardên bajar daliqandin, Rêxistina BDP'ê ya Amedê jî, wêneyên 36 siyasetmedarên kurd ên bi kelepçe yên bi nivîsa "Duh Halepçe İro Kelepçe" li billboardên bajar daliqandin.

**Operasyonên li dijî BDP'ê li Elezîz, Amed, Semsûr û li Rihayê hatin şermazkirin**

Lî Amedê, bi armanca şermazkirina operasyona li dijî BDP'ê di pêşengiya KESKê de bi piştgiri dayîna gelekî nûnerên saziyên sivil, meşek hate li darxistin. Serokê Giştî yê KESKê Samî Evren jî serokên giştî yê sendiqayên KESKê û rêveberên navenda giştî û bi sedan kesên li Parqa Koşuyoluyê hatin cem hev, heta ber avahiya Rêxistina BDP'ê ya bajar meşiyên. Di meşa ku

panqarta "Me hêviyên xwe yê aştiyê wînda nekirin, em di meşandina têkoşina aşti, demokrasi, ked û azadiyê de bibiryar in" vekirin de wesayîten li rê diçûn bi qorneyan û welatiyan jî bi tililî û çepikan piştgiri dan meşê. Kedkarên ku wêneyên dest kelepçekirî yê şaredar û siyasetmedarên kurd bi yaqeyên xwe ve daliqandin de di meşê de dirûşmeyên "Duh Halepçe, İro Kelepçe", "Vîna gel nayê astengkirin", "Deng bidin aştiyê agirbesta du alî", avêtin.



Lî Navçeya Wêranşare bi sedan jin li ber Dibistana Seretayî ya Dumlupınarê li hev kom bûn û bi meşale û dowizan meşiyên û operasyona li dijî BDP'ê şermaz kirin. Jinan ligel zilaman heta

navenda navçeye meşiyên û operasyon û girtin şermaz kirin. **Parêzer, li dijî bêdeletiyê meşiyên** Baroya Amedê bi mebesta şermazkirina ê zext û operasyonên

li dijî BDP'ê meşek li dar xistin û daxuyanîyek dan çepemeniyê. Polîsan xwestin ku çepemeniyê asteng bikin û nehêlin daxuyani bê şopandin. **AJAN SAN**

# Zordariya "îfade dayîne" a dewleta Tirk dewam dike

Li dijî îradeya gelê Kurd, helwestên qirêj ên dewleta Tirk her diçe zêde dibin.

**ENQERE, Tirkîye (Pêşketin)**

Polêsên ku bi ser navenda BDP'ê de girtin, serî li rêbazê ecêb û dijdemokratîk dan. Polêsên sivil li navenda giştî ya BDP'ê, li parlamenterên kurd geriyên. Balkêşê ku ev kirina qirêj piştî civîna MGKê ya pêr pêk hat.

Rojên dawî gotina Serokwezîrê Tirkîyeyê Tayîp Erdogan a "Emê vegerin serê serî", li qada siyaseta legal, weke 'Qirçirina siyasi' tê bicihanin. Girtina DTP'ê ya di 11'ê Kanûnê de jî bo vê minakeke pir girîng e. Paşê bi darbeya 24'ê Kanûnê, 48 siyasetmedar û nûnerên rêxistinên civakî hatin girtin.

Ahmet Turk, diyar kir ku qiriza îfadeyan bi zordariya xala 14'emîn a Makeqanûnê hatiye vê astê û wiha got: "Di demek munasib de em dê biçin îfade bidin." Turk jî bo 3 parlamenterên BDP'î jî anî ziman ku ew ê neçin îfadeyan nedin. 11'mîn Dadgeha Cezayê Giran a Enqereyê derbarê Parlemtentera BDP'ê ya Stenbolê Sebahat Tuncel de biryara 'Binçavkirina bi zorê ya bêroj' da. **DİHA**



# Dewlata İranê ji bo "cehş" kirina Kurdan hewl dide



Hate zanîn ku rayedarên leşkeran têkildarî pêşxistina cerdevaniyê li gundên sînor dest bi civînan kirin. Hat hînbûn ku piştî civînan jî sercerdevaniyê serokên eşîran peyvirdar kirine.

**WAN (Pêşketin)**

Li gorî agahiyan, di çarçoveya peymanên dewleta Tirk û İranê imza kiriyê de, Dewleta İranê li sinorê Tirkîyeyê gelek gundan çek belavkirine û pergala cerdevaniyê daye dest pê kirin. Li hinêk gundan gundî bi zori kirine cerdevan.

Civînen di bin serokatîya Rayedêr Artêşa İranê Kerimî Granen de tîn kirin Serokê Êşîra Avdu û berpirsiyarê herêma Gengeçin Gargarin Simitko, Hekî (axayê Êşîra Hinarê), Kurê Reşît Begê Serokê Êşîra Herkiyan Hacı Arîf, jî herêma Şapurê Avdu, bi mezinên eşîr û keyayên gunda re

civîn tene lidarxistin. Hate zanîn ku di civînan de bi boneya gel bikin cerdevan serokên eşîran bi taybetî hatine peyvirdarkirin. Piştî Dewleta İranê pergala cerdevaniyê da dest pêkirin, li sinor lez dan çêkirina qerqolan û diwarê sinor. Hate zanîn ku diwarê li ser sinor tê çêkirin 20 km yan derbas bûye... **DİHA**

# Parlamenterê Mûşê Nûrî Yaman bû serokê grûba BDP'ê

Grûba BDP'ê, civîna xwe ya yekem sibê li dar dixwe.

**AMED (Pêşketin)**

Grûba BDP'ê, civîna xwe ya yekem sibê li dar dixwe. Serokê BDP'ê Demir Çelik, jî ber ku ne parlamenter e mafê wî tine ku li parlamentoyê biaxive. Piştî ku Partiya Cîvaka Demokratîk-DTP hate girtin û parlamenterê DTP'ê tevî

Partiya Aştî û Demokrasiyê-BDP'ê bûn, parlamenterê herî mezin, parlamenterê Mûşê Nûrî Yaman wek serokê grûba BDP'ê hate hilbijartin. Grûba BDP'ê sibê di bin serokatîya Yaman de civîna xwe ya yekem li dar dixwe. Ji ber ku Serokê BDP'ê Demir

Çelik ne parlamentere mafê wî tine ku li parlamentoyê di civîna grûba partiya xwe de biaxive. Parlamenterên Diyarbekirê Selahattin Demirtaş û Gulten Kîşanak jî bûn wekilên serokê grûba BDP'ê. Weke tê zanin ev herdu parlamenter wekilên grûba DTP ya girtî jî bûn. **pêkhatiyê...**

# Mahkemê nexşerêya Ocalanî ji Tirkîyeyê xwest

Mahkema Mafên Mirovan ya Ewropayê ji Tirkîyeyê daxwaza nexşerêya Abdullah Ocalan kir.

**HEWLÊR (Pêşketin)**

Mahkema Mafên Mirovan ya Ewropayê li ser daxwaza parêzerên wî ji Tirkîyeyê daxwaza nexşerêya serokê PKK-ê

Abdullah Ocalan kir. Weka tê zanin Ocalan di meha Tebaxê de dîtinên xw eyên derbarê 'çareserîya pîrsa kurd' de nivîskî teslimî birêvebirîya

girtigeha Imraliyê kiribû, lê heta niha metna ku ew weka 'nexşerê' binav dike, negihaştîye parêzerên wî.

# Xebatên bo tune kirina Hesenkêfê ji nû ve destpêkir

Xebatên bo tune kirina Hesenkêfê ji nû ve destpêkir

**BATMAN (Pêşketin):** Wezîrê derdorê adewleta Tirk Veysel Eroğlu diyar kir ku kêmasiyê krediyê a bo çêkirina bendava İlisuyê ji 3 banqeyan hatiye peyda kirin û got ku hevditînen bi Xezîne re destpêkirîye. Eroğlu got: "yên ku dijî çêkirina bendavê derdikevin xayîn in, naxwazin aborî pêşve". Eroğlu diyar kir

ku ji bo gundiyan İlisuyê jî xaniyên nû hatine çêkirin. Li gor agahiyan dibe ku herêma dirki ya Hesenkêfê ger tiştek neyê kirin di nava 5-6 mehan de dikare di bin avê de bimîne. **Şirketên biyani vekişîya bûn** Di encama kar û xebatên hawirdorparêzan û rêxistinên civakî sivil de Elmanya, Awusturya û Swîsre n dayîna krediya ji bo projeya bendava İlisuyê

betal kirinbûn. **'Şûnûwar nayên guhertin'** Komîteya Pisporan diyarkirin ku 12 abide ne mimkunin ku bînan guhertin. Tê gotin ku wan jî berê vê tiştê anîne ziman lê hêvî dikin ku ev daxwaz niha hê baştir hatyê famkirin. Ne tenê nixweke dirokê tê holê radikin... Bi xerakirina Hesenkêfê dewleta Tirk ne tenê diroka kurdan di bin avê de dihele heman demê de;

• Kêşeyên sosyo-aborî ku ji ber bendavê wê derkevin holê nayê dîtin. • Kurdên bakûrê Kurdistanê jî ber şerê di navbera Dewleta Tirk û PKK de neçar mane ku koçî bajarên mezin bikin. Kesên ku koçber bûne jî ber bêkari û delfetên kêmdinava hejariyê de dijîn.

• Hesenkêfê xwedî li rabirdûyê 12 hezar saliyê û bi pir, mizgeft û gelek berhemên dirokî ku ji Asûriyan, Romayîyan, Persan, Medan, Greekan, Bizansiyan û ji gelek şaristaniyên din maye bo gelê Kurd nixweke dirokê ya bêhempa ye. Ji ber vê yekê jî divê Hesenkêfê were parastin. **HAWAR NET.com**





# Pêşmergeyên Kurdistanê dibin xwedîyê çekên giran

Kurdistan Federal ji bo avakirina ordiyeke modern gava pêşî davêje


HEWLER (Pêşketin)

Rayedarên Hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê diyar kir ku di dema nêz de dest bi kirina tang û helikopteran bikin. Ajansa Çavkaniya Navendi ya girêdayî Saziya Radyo û Televizyona Îranê li ser mijarê agahî da. Ajansê ji bo agahiyê Çavkaniyên YNK'ê wek referans pêşkêş kir. Hat gotin ku Berdevkê Hêzên Pêşmerge yê Herêma Federal a Kurdistanê Cebbar Yaver diyar kiriye ku di

demê nêz de rêveberiya herêmê tank û helikopteran ji dê bikirin. Li gorî agahiya ku Berdevkê Hêzên Pêşmerge yê Herêma Federal a Kurdistanê Cebbar Yaver di nav wan û Wezaretê Parastîna Îraqê de peyman hatiye mohrkirin. Di çarçova peymanê de her du mehan yek Herêma Federal a Kurdistanê xweser karen çek bikire. Ji bo ku Herêma Federal a Kurdistanê karibe van çekan bikire pêwîstiya wê bi butçeyê heye. Yaver destnîşan dike ku ji bo kurd karibin çekên mijara gotinê

bikiirî li bendê ne ku hikûmeta navendiya Îraqê vê butçeyê cihê bike û bide wan. Cebbar Yaver vedibêje ku heta dawiya sala 2011'an ku Amerîka ji Îraqê bi giştî dê vekêşe lezê didinê ku Herêma Federal a Kurdistanê ji bibe xwedî hêz da ku karibe di nav xweyî de û li ser sinoran parastina herêmê bike.

AJANSAN



## Ocalan: 'Operasyona li dijî gel provokasyon e'

Rêberê PKK Abdullah Ocalan di hevditina xwe ya bi parêzeran re de operasyonên keleçekirina îradeya gel a 24'ê kanûnê weke provokasyon bi nav kir. O calan got ku operasyona li dijî şaredaran provokasyon e û wiha got: "Ev operasyona li dijî şaredaran di rastiyê de, provokasyonek e. Gelê kurd ku li dijî her tiştî xwe bi rêxistin kiriye, wê rêxistinbûyîna xwe ji diparêze. Bê guman wê rêxistinbûyîna xwe biparêzin, çalakîyên protestoyî ji wê bi vi awayî bi pêş bixin."

## Di nav salekê de 1000 ciwan tevli Gerîlayan bûn

Di sala 2009'an de berê ciwanên kurd li çiyayên Kurdistanê bû. 991 ciwanên kurd tevli nav refên gerîlayan bûn

ÇILE 2009: Di hefteya yekemîn a 2009'an de 50 şervanên nû dewreya xwe ya perwerdehiyê qedandin û tevli nava refên Hêzên Rizgariya Kurdistanê (HRK) bûn.

SIBAT 2009: 35 şervanên nû yê dewreya perwerdehiyê ya bi navê Aras Rojhilat û Şehîd Aras, merasîma mezûniyetê hate lidarxistin.

ADAR 2009: 43 şervanên nû yê dewreya perwerdehiyê ya Şehîd Çekdar di hefteya yekemîn de bi merasîmekê mezûn bûn û tevli nava refên HPG'ê bûn.

Di meha adarê de 47 şervanên nû yê dewreya Di meha adarê û Cejna Newrozê de ji 36 şervanên nû piştî ku perwerdehiya xwe qedandin tevli nava refên gerîla bûn.

NISAN 2009: 35 şervanên nû tevli nava refên HPG'ê bûn. HEZİRAN 2009: 97 şervanên nû û tevli refên HPG'ê bûn.

Di dawiya mehê de TIRMEH 2009: Ji Dibistana Gerîla ya Şehîd Erdal 72 şervanên nû tevli bûn.

TEBAX 2009: 145 ciwan tevli nava refên HPG'ê bûn.

İLON 2009: Di Di destpêka mehê de 42 şervanên nû ji dewreya perwerdehiyê ya Şehîd Rizgar mezûn bûn û tevli nava refên gerîla bûn.

COTMEH 2009: : 185 ciwan tevli nava refên HPG'ê bûn. MIJDAR 2009: 76 ciwan tevli bûn. KANÛN 2009: 160 ciwan tevli gerîlayan bûn.

DİHA

# Berf bakûrê Kurdistanê bibandor e

Barîna berfê Kurdistanê girt bin bandora xwe



AMED (Pêşketin)

Roja yekşemê di rîya Bingol û Erziromê ji ber berfê hatin girtin. Wesayîten ku di rê de asê man bi qasê 10 seatan li benda alikariyê sekinin. Rêwiyên ku di rê da ma bûn hatin rizgar kirin. Barîna berfa zêde li Kurdistanê bandora xwe berfirehtir dike

Di gelek bajaran de berf bariya û di gelek bajaran de ji barîna barana xurt didiome û pileya germahiya hewayê ji gelek daketiye. Li Wanê yekem berfa salê bariya. Her wiha di gellek bajarên din de ji pêşbîniya barîna berfê heye. Tê diyar kirin ku di 3-4 rojên pêşiya me de li tevahiya

bakûrê Kurdistanê berf bibare. Li bakûrê Kurdistanê û perçeyên ên Kurdistanê gellek riyên gûndan ji ber berfê hatin girtin. Li gor agahiyan ji saziya Meterolojiyê de di hefteya pêşiya me de germahiya hewayê bi qasê 10-15 pile wê dakeve û bandora berfê ji zêdetir be. HAWAR NET.com

## KCD olan li Mêrdînê dicivîne

Komîsyona Baweriyên a Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bi armanca nirxandina pirsgrêkên baweriyên li Mezopotamya yê bi beşdariya baweriyên cuda li Mêrdînê 'Xebata Baweriyên Mezopotamya yê' pêk tîne. Endamê Komîsyonê Abdulkerîm Bingol diyar kir li Tirkîyeyê li hemberî baweriyên ji yekşewaziyek heye û lazîm e KCD di warê baweriyên de xwedî perspektîfê be. Komîsyona Baweriyên a KCD'ê bi armanca çareserkirina pirsgrêkên baweriyên Mezopotamya yê û afirandina politikaya KCD'ê ya têkildari baweriyên di navbera 6-7'ê sibatê de bi beşdariya gelek bawerî û çandên cuda li Mêrdînê bi navê, "Xebata Baweriyên Mezopotamya yê" civinekê pêk tîne. Di çarçoveya xebata li li Malên Ardobe yê diroki tê lidarxistin de dê rûniştinên bi sernavên, "Pêşketina diroki ya bawerî û çandên Mezopotamya yê û bandora wan a iro", "Feraseta laîqtiyê ya li Tirkîyeyê tê meşandin, eletewşîya wê laîqtiyê û laîqtiya rasteqîn" û "Bi hev re ji yana bawerî û çandînê cuda û nêzikatiya KCD'ê" dê xebat bîn meşandin.



## Panaromaya 2009'an

Di sala 2009'an de pêşveçûnên li Kurdistanê û bûyerên giştî di HAWAR NET.com de ye...

Navnîşan:

<http://www.hawar.net/kurdistan/rojev/2010/01/05/PANORAMA2009.html>



HAWAR NET / NÛÇE Û AGAHÎ  
TU LI KÛ BÎ, NÛÇE LI WÊ DERÊ YE  
hawarnet.com Kurdî û Kurdistanî



# Îtîfaqa kurdan û Roja Mehşerê

ROJGIRAV AMED

Li ser vê axa qedim, qewmên ereb, faris, kurd, ermen, cihû û tirk jiyane. Ji van qewman, dewletên ereban ku pêşengiya wan qralên xweşroş dikin, her dem ji çolên rût tazî xweziya xwe bi Mezrabotan anîne û bi îdeolojiya îslamê pêşerojê kambax anîne ser rûyê qewmên qedim.

Cihûyên ku ji ci û warên xwe hatine qewitandin, li çar aliyê dinê belav bûne û ji qirkirinan hatine derbaskirin; bes iro ji vê çarenûsa xwe ji bir kirine û tiştê ku hatiye serê wan tinin serê gelên rojhilatîyan. Ji van qewman herî zêde tirk divê li ser wan bê sekinandin.

Em her dem dibêjin ku di sala 1071'an de tirk hatin ser vê axa pîroz, me bi hev re têkoşîneke hevbeş da. Herî dawîn di şerê rizgariya welat de em bi hev re di çeperekê de mirin; bes iro ev ji hate jîbirkirin û ev sed sal in kurd ji hêla wan ve, bi awayên herî dij mirovî ji qirkirinan re derbas dibin.

Bila ev baş bê zanin ku her çiqas em bi van hevkarîyên bi tirkan re serbilindbûn ji -bes ev ji bona gelên tirk derbasdar e- bes ji pratika dehan salên dawîn derketiye holê ku ev başiya kurdan di avê de çûye. Iro hestiyên kalikên kurdan ên ku bi deshilatdarên tirk re hevkarî kirine, diêşin.

Ev qewmê macêr, ji çandeke hov tê û ev çanda ku bi kevneşopîya dewletbûyîne re bûye yek, hê ji weki Leviathan bûye bela serê vê axa pîroz. Mixabin a herî xeter ji ev e ku li ser navê gelê tirk, gelek kesên

dewşerme û xweşroş ve yekê dikin. Lê zû tê jîbirkirin, bi hezaran salan li ser piştê hespan, bi talankirinan hatine vir, li ser vê axê ked nedane û li ser bermahiyên hezaran salan rûniştine.

Di ser de ji xwe li jora her geli de dibinin û ji xwe pîroztir tu qewmî, gelî yan etnisîteyî ji nabinin. Ji bo ku vê çanda xwe ya kambax berdewam bikin ji, her cure îtîfaq û hevgerîtinan dikin û bûne pêlistokên rojavayîyan.

Niha em li roja îroyîn binêrin; di sa kurdan qetil dikin, hebûna wan qebûl nakin, heta dibêjin "kurd herin li hîvê ji ji xwe re holîkek ava bikin, em ê qebûl nekin"

Ev tiştên ku hêz dide dijminên kurdan û wisa bê paye bi wan dide gotinê, nebûyîna yekîtiya kurdan e. Ger ku kurd bi hemû hêza xwe yekîtiya xwe çênekin, hevkarî nekin, siyaseta û qedera xwe nekin yek; wê dijminên kurdan tu car kêr nebin, wê tehamûla wan ji mafekî herî biçûk, azadiyek, bermahiyek an pêşketinekî re tunebe û em ê her dem bi qirkirinan re rû bi rû bimînin. Niha li başûrê Kurdistanê kurdên ku bi ked, îtîfaq,

ixanet û gelek tiştên ditir ji xwe re azadiya xwe afirandine, ev bermahî ji di çavên wan re diçe. Û her roj tehdîtan li kurdan dikin. Dev ji xewnên bajarê Kerkûk û Mûsilê bernedandin. Li ser sinor leşker kom kirine û ji kîsên vala zirtên xwe dikin.

Em ji vê diyar dikin ku bajarê Kerkûkê bajarê kurdan e. Ji bo wê xwîna hezaran rijiyaye. Dê kurd di sa ji ji bedeldayînan bi paş ve nemînin. Lê vê carê rewş dê cuda be.

Em ji dewleta tirkan û ji artêşa wê re dibêjin; "kerem bikin werin, hûn gelek caran hatin, wê demê li pey we gelek hêzên din hebûn, bes digel vê ji hûn bi ser neketin, gerila her hal li serê van çiyayan pîvazan naçînin, ew amade ne û li benda we ne..."

Gelek kesan xwest vê axa pîroz bi dest bixin, gelek împaratorî hatin û çûn, gelek tofan qewimîn; bes iro kurd li ser vê axê, li rojhilat bigire heta rojava, bakur û gelek deverên din li ser piyan e û hemû çiyayên azadiyê wargehên wan in.

Bila gelê me yê başûrê yekê baş fêm bike ku yê bi wî re dijminahî bike û êrişê bine ser wî, dê gerila li hemberî xwe bibîne. Ev hêza wan heye û li benda roja xwe ne da ku ji dijminê kurdan re roja mehşerê bidin tamijandin. (jêgiran)

# Welat, Welatîni û Al

CELADET BEDÎRXAN

Welat erdê bav û kalikên me ye. Welat ew der e ko, pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitine û li wê mirine. Welat ew diyare ko, em tede sekinine û rûjêkê di nav axên wî de bêne veşartin.

Welatî bi qenciya hev şa dibin, ber xirabîya hev dikevin. Şin û şahînetê wan yek in. Xelkê welatekî brayên hev, pismamên hev in. Her gav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahiya welatê xwe dixebitin.

Kam û armancên wan yek in. Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa drijênin. Herê dixebitin ko welatê wan mekevit bin destên miletên din..

Xelkê welatekî, welatîyên hev in.

Borî, hal û dawîya wan bi hev re girêdane. Zmanê wan, girêdana wan, her hal û lebtên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûniştin û mirine.

Lê miletî hene ko welatê wan, bi awakî, ketiye bindestên neyar û dijminan Wek welatê miletê me, Welatê Kurdistanê. Ev miletê ha ji bona rizgariya welatê xwe dixebitin. Xebata wan ev e: Rûjêkê berê biyaniyan ji welatê xwe derînin û mîna miletên din biserxwe bibin, di nav hev de bi xweşî, û bi qenci bîjin. Herkes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe dike. Hej kirina welatê di dilê me de hej kirineke mezin û bilind e. Em pê xurt, zexm û

canfeda ne. Jê re welatîni dibêjin. Welatîni di hundirê me de agirekî miqedes e. Bîjin. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welatê dide hez kirin.

Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya, deşt, dar û kevirên welatê me ji yê welatên din spehîtir, xweştir û şerîtir in. Her milet xweyîyê alekê ye. Al nişana miletê û welatê e. Tevayîya heyîna miletan di ala wan de civiyaye.

Al namûs, rûmet û bextê miletan e. Zarowên her miletî ji bona bilindî û biqedrbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin. Ala her miletî jê re beha ye.

Di cejn û şahînetan de qesr, seray, xanî û kûçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slavan lê dikin, wê maç dikin, datînin ser serên xwe. Alên miletên biserxwe, di ser kelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de dikevin pêşiyê.

Lê alên miletên dil, wek ya miletê me, ji her derê bi kamirani biderkiri, lihevte wandî li ser dilê zarowên wan de hilandî ne. Miletên dil dixebitin, xwînên xwe dirijênin ko biyaniyan ji welatê xwe biqewitînin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçîkinin. Ala her miletî bi çend rengan û bi siklekî din e.

Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de rojdiçirise. Divêt zarowên Kurdistanê bixebitin û rûjêkê berê ve rojê hilînin, ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilind bikin, li wê bibrûskînin, welatê xwe ser avahiya xwe a pêşîn vegerînin û di bin tava wê de biserxwe û bi kamirani bîjin. Kovara Hawar (hejmar: 9, 1932)

# HÊZAXÊZ



# Siyaseta Kurdan Felaketa Zimanê Wan e!

M.Nureddin Yekta

Her milletek ji xwe re xizmetê dike, nivîskar, hunermend, siyaseta-medar, xwendevan û hwd... Sifetê mirov çî dibe bila bibe, dema mirov xwest ji gelê xwe re xizmetekî bike divê mirov realîta wî gelê bide ber çavên xwe! Bi çî? Bi her awayê! Bi oli, bi ziman, bi dirok, bi çirok, bi cilan, bi zewacê û hwd. bi sedan tiştên din! Hûnê bêjin gelo em xizmetê nakin, an xizmetkarê vî gelê tunene? Belê hene, lê şiklê xizmetê şaş e! Wek nivîskarên Kurdan bi zimanê gel xizmetê nakin! Kurdên Bakur dibên bila tirk ji meramên me bizanîbin, ji bo wî û him ji ji bo tirkî hêsan e ango ji bo xwendevanan em tirkî dinivîsin. Nivîskarên Başûr û Başûrê Rojava ji dibên erebî hêsan e û ji bo ereb ji ji me fam bikin, Kurdên Rojhilat ji her wusa ji bo farisî ji xwe re mana dibînin. Gelo kî wê ji bo Kurdan binivîse ku Kurd ji fam bikin, Kurd ji ji hev fam bikin? Zimanê me hatiye rewşekî wusa ku her zaraveyek bi sere xwe Hinek dibêjin ku cudabûna zarava ji dewlemendî ye. Belê, lê ne ku em di şûna bêjeyên zaravayên xwe yê din de, bêjeyên biyaniyan bikar binin! Weka Bakur di axaftinên xwe de di şûna bêjeyên zaravayên din (sorani, dimili, hawramani) bêjeyên. Bi min di warê asimilasyonê de, rêxistin û sazîyên Kurdan, ji dagirkeran zêdetir xesare dane ziman û çanda me! Dikarim bêjim ku ev 30 sal e li Bakurê Kurdistanê, hemî rêxistin û parti û sazîyên Kurdan, Kurdan fêrê zimanê tirkî kirin.

Dewleta Tirkiyê 80 salî nikaribûn Kurdan fêrê tirkî bikira, lê sazîyên me sax bin, wan vî wezîfê bi cih anî! Çima? Lewra hemî rojname, kovar, sohbet, civin, niqaş, perwerde bi zimanê tirkî ye. Gellek ecêb e, hin kesên me yê ku salên wan li jor in ji, li welat tirkî nizanin, lê dema tîrên Ewropa fêrê zimanê wî dewletê nabin fêrê zimanê tirkî dibin. Belku bala gellekan nakşîne lê mixabin vaye rastîyek e!.. Rojname û kovar hene tenê nav Kurdi ne, lê di wî kovarê de hûn yek hevokê Kurdi nabinin! Ez dikarim viya bi xetên qalind binivîsim "Siyaseta Kurdan e vî 30 salê dawîn, di ware ziman de felaket û musibeta herî mezin e ji bo vî Gelê." Ka em bifikirin! Gelo di çend malper, kovar an rojname an ji televizyonên Tirk, Erebi û Farisan de ku Kurd ji baş fam bikin bi Kurdi diaxivin an dinivîsin?... Ger hin televizyon heftê seetek-du seet bi Kurdi biaxivin ji, ew axaftin tenê ji me re xeberan dide! Bi zimanê me, me înkâr dike!.. Bi min pîrr acil divê sazîyên Kurdan tevli nivîskar, rewşenbîr û hwd. bicivin û biryarekî bidin da ku ji vir şûn ve her kes tenê zimanê Kurdi bi kar bîne. Ev biryar her wusa divê biryarekî siyasî be ji, ne tenê bi kampanyayekî yan bi tewsiyekî bêjin û çend roj şûn ve ev biryar bê jîbirkirin!

Bes di televizyonan de rojê tenê niv seetêkî bi zimanê dagirkeran nûçe werin xwendin bes e. Pêwîst e him ji zor pewîst e ku di radyo û televizyonên me de tu wext sitrana dagirkeran neyê lîxistin û neyê guhdarîkirin!.. Min vî daxwaza xwe pîrê caran di civînan de ji anîye ziman, mixabin her çiqas em dibên ku em Kurd in ji, mejiyê me yê dagirkeran e!.. Hin dibêjin "ger em bi tirkî yan erebî binivîsin, nivîs zêdetir xwe digihîne xwendevanan û sûda wî zêdetir tê ditin!" Mixabin ez tevli vî fikrê nabim. Her çiqas rast e, zêde were xwendin ji, xesara wî zêdetir e. Lewra em bi vî awayê dibin sedema Ger em biryarekî wusa bidin û bi tenê zimanê xwe bikar binin, xwendevan neçar dimînin ku nivîsan, rojnameyan bi Kurdi bişopînin. Wê demê di demekî pîrr kurt de, xwendevan hemî bikaribin bi Kurdi bixwînin û binivîsin. Na ku em him bi Kurdi û him ji bi tirkî yan erebî binivîsin, wê demê zimanê biyaniyan ji xwendevanan re hêsantir tê û xwendevan zimanê xwe bi kar naynin. Wek tecrûbekî hûn dikarin nivîsên xwe bi du zimanan binivîsin, di heman rojê û seetê de deynin û bi tirkî çiqas? Bi hindikayî nivîsa Kurdi 10-15 car kêmtir tê xwendin çima? Lê ku nivîs tenê bi Kurdi be?... Bi hêviya civin û biryarekî wusa netewî.



# Erkên medyaya Kurdî û kêmasîyên bingehîn

Di belavîya erk û xebatan ya di têkoşîna serxwebûna Kurdistan û pêşxistin-parastina şaristanîya Kurdî û pêşketina aborî û civakî de bareke mezin heta bi qasê partî û rexistinan dikeve ser milê medyaya Kurdî.

## Serhad B.RÊNAS

Rewşa medyaya Kurdî ya îroyîn hêdi hêdi ber bi baş bûnê ve diçe. Ji ber ne serbixwe buyîna Kurdistan bi temami rêkûpekk bûyîna medyaya Kurd ne gengaze.

Kêşeya zaravayan ji mîna berê ne mijareke ku di nava gelê Kurd de bibe egera ji hev dîr mayîne. Medyaya Kurdî di salên dawî di hemû beşên medyayê depêşdikeve. Niha bi dehan tv û radyo, weşanên interaktîf ya nûçe û agahiyan (malper), bidehan rojname û bi dehan kovar li Kurdistana Azad, li hemû beşên Kurdistanê û li Ewropa weşanê dikin. Lê hin ji pirsgrîkên weki dezgeh bûn, profesyonelî, nebûyîna çerxa aborî û reklamê, meseleya elfebe, -ji xeynî

Kurdistana federal- astengên dewletên dagirkerên Kurdistanê, xemsariya hinek Kurdan, pirsgrîka partîvanî û ne serbixwe bûyîna medyaya Kurdî û hwd... berdewamin. Problemek din ji meselaya siyasîye.

Organên bi giranî medyaya Kurdî **gîredayê partîyan e**. Li cihanê ji %100 medya ne serbixweye. Helbet ev tişteke xwezayîye. Lê dive rojnamegeriya Kurdî xwe nêzi serxwebunê re bikîşîne. Divê çapameniya Kurdî Kurdperwerî, niştîmanperwerî, demokratîk, modern, profesyonel bûn, rast bûn, sirûsthezi, rizgarî û pêşketina Kurdistan û berjewendîya gelê Kurd weki esas bipejirîne. Sedemên bi vi rengî û hin sedemên din ji dibê asteg ku medyaya Kurdî bigehêje asta medyaya Cihanî.

Ger Kurd di vê konaxê de medyayê di zûtirin dem de negihênin asta navnetweyî wê zirarê ve yekê bo hemû têkoşîna netweya Kurd û pêşketina Kurdistanê bigehê. Ji ber ku medya li Kurdistanê ne hêza çaremin belki hêza duyemîne ji. Di belavîya erk û xebatan ya di têkoşîna serxwebûna Kurdistan û pêşxistin-parastina şaristanîya Kurdî û pêşketina aborî û civakî de bareke mezin heta bi qasê partî û rexistinan dikeve ser milê medyaya Kurdî. wWisa dixuye ku ji ber pêşketinên global di warê teknoloji û medyayê de ger Kurdistan bi temami serbixwe be ji êdi girîngî û hêza medyayê li Kurdistanê ji rêza duyemîn kêmîtir nebe.

Îro piraniya wan li Kurdistana Azad, nêzi 500 kovar, 50 rojname weşanê dikin. Ji wan 4 rojnameyên ku li Kurdistana Azad weşanê dikin rojnameyên rojana ne. Li bakûrê Kurdistanê rojnameya Azadiya Welat ku weşana rojane dike û yekane rojnameya rojane ya bakûrê Kurdistanê. Her wiha li Kurdistana bakûr û rojhilat û başûrrojava rojnameyên hefteyî, panzdehrojî ji heye. Li Kurdistana Azad 15 ser satalaytê bi giştî ji 30ê zêdetir televizyonên Kurdî Biqasî wan ji radyo li Kurdistana Azad weşanên xwe berdewam dikin. Her wiha li Ewropayê ji 6 televizyonê satalaytî heye. Her wiha ser internetê ji her perçeyên Kurdistan û Ewropa bi sedan malper heye ku

di medyaya Kurdî ya interaktîf-Online de cih digrin.

Ji ber ku internet cihêki azade, erzane û sinoran nasnake gelê Kurd ji bi hêsani xwe internetê de gihandin astekê baş. Em rewşa Cihanê ji bidin ber çavan ku edî medyaya elektronîk her roj girîngiya xwe zêdetir dike pêwistiya pêşketina medyaya Kurdî ya elektronîk derdikeve holê. Ger internet hin zêdetir berdari were bikaranîn him sêra medyaya Kurdî cûdatir be him ji tîkariya internetî di jiyana civakiya Kurd de û pêşketina rewşa politik a Kurdistanê ji zêdetirîn be. Bandorên malperên wek HAWAR NET, NetKurd, AvestaKurd, Rûdawnet, Pukmedia, malpera Firat News û çendmalperên din minakên herî baş a ve yekê ye.

serhadbrenas@yahoo.com

## Gelê Kurd û Dînê Îslam

### CELAL AYGEN

Homay 80 ser re ver, dewlet da Tirkan û Ereban. Labelê dewletey inano dinî Homay heme ca di û heme wext di qedexe kerd. Herindey Şerîetê Homay, qanunî Ewropa reyda gelê xo ser hûkûm kerd. 80 ser miyand Tirkan û Ereban de, heskerdîşî dinî Îslam kêma, heskerdîşî îdeoloji ey Ewropa zêda. İn dewletî, hem îmanî Tirkan ra, hem zî îmanî Ereban ra zaf çî girewt û berd. İnano pey dewletan di xo serxoş bi, zilm kerd Kurdan, kufur kerd dinî Homay û dinî Homay ra tim dîr kewt î. İn 80 ser di, gelê Kurd hem sistem Tirkan ra, hem sistemî Farisan ra, hem zî sistem Ereban ra zaf ezîz, teda û zilm kaşkerd. Yin welatê ma xo miyanid barkerd, mali mulki ma dest ma ra girewt, gelê ma qetl kerd. Yani ma welatê xo Kurdistan di bi esir, ma bi mehkuûm, ma bi xerîb. Tirk, Ereba û Faris dinî Îslam ra dûrkewtişî ra insaf, edalet û biratiyey xo vir kerd. Tecawuz kerd dinî Homay û heqê Kurdan. Pili in dewlete, tim bedelayî labelê tecawuzî Îslam û Kurdan ser yew wext zî nêbedelayî. Tirk, Ereba û Farisan miyand musulmaney zaf kêmbî. Yin miyand zî bêqewet û mezlûm kewt î. Hemberê na rejim kafiran di tekoşin kerd, labelê nêşîyay serkewte bibî. Sistemî kafir gelê xo dinî Îslam ra dîr vistibî.

Gelê Kurd, ne dewletey Tirkan ne ey Ereban ne zî ey Farisan qebul nêkard. (Semedê dinî Îslam û azadiyey xo zaf hew tekoşin kard, zilm û qetlîam di, şehîd day) Gelê Kurd ne Kemalîzm, ne baasîzm, ne zî Şaxey Îran qebul nêkard. Gelê Kurd miyand heway Şêx Seîd, Seîdê Nursî, Şêx Mehmut Berzencî, Şêx Ebdulsalam, Mela Mistefa Berzanî alimên pil vecîyay û hemberê zaliman û kafiran re tekoşin kard. Labelê dewletey Tirkîye, Îraq, Suriye û Îran (wextî Şax) dinî Îslam û mafê Kurdan qedexe kerdîşî ra tewa nêmendî.

Na 80 ser miyand Kurd bêdewlet mendî. Labelê her wext gelê Kurd wayîr dinî Îslam û dinê Îslam re heskerd. Rayer Homay di goreb xo dest ra çî amewo erd ca. Homay Teala heme çî veynen o, eşnawen o. Homay mîletan miyand rojan taden o. Ay insonik, ay mîletik dinê Homay ra xîzmet kerd; Ellah Teala dest erzeno yin tepîşeno û a mîlet werazneno, ano halê serkewte di edelnen o.

Gelê Kurd gerek bizana ki, qederê Kurd û qederê Îslam yew biyo, yewbinan tepîşt o. Tekoşinê Şêx Seîd ra dima, welatey ma Kurdistan û dinê ma Îslam kewt bin payo. Hetanê iro in hali xirab ma ser ra nêheweyna.

Wezîfey ma Kurdan zaf xîş/pil biyo. Wazîfey ma, wayrey dinê Îslam kardîşî û mafên gelê xo semed xebetiyayîş o. Dinê Îslam rayîrê azadiyo, rayîrê edalet, rayîrê nîmetên dînya û axîreto. Dewlet weş a. Dewlet rayer nîmetî dînya û ey axîret zaf weş akeno. Kam dewlet? Dewlet ey Îslam...Dewletey Îslam semedê edalet, semedê biratiyey, semedê yewtepiştayey emrê xo viyarnen a. Dewleta ki, rayîr Ellah taqîp ken a, dewleta ki rojê meşer ana fikir gelê xo. Demek dewlet tena yew çî xîşîniya. Dewlet ey Firawun, Nemrut, Ebu Cehîl, Yezîd, Cengîz gelê xo hem dînya di hem zî axîret di helaq kard.

Homay Teala yew nîmetî pil daw gelê Kurd. No nîmet gelê ma miyand çîray nêvecaw o. Ay nîmet heskerdîşî û xebatey dinê Îslam o. Homay Teala xebatey gelê ma rey ra dinê Îslam û gelê Kurd piya werazneno inşeaallah

## Dewlet û Konfederalîzm...

### Mamoste Marûf

Ji xêra Xwedê re...

Wisandîxuyê ku li hevnekirina Kurdan a li ser dewlet û konfederalîzmê, dê hê pir û pir bikudine. Tîrsa min ew e ku ev nîqaşên ku heta niha, çê-xerab, bi awakî aşîtiyane hatin kirin kirin, wek di hin nivîsan de dixuyê, veguherin çêr û xîrecîrên dermîrovahî û rê li ber dubendîyêke malkabax vebe.

Ji bo pêşî lê girtina ve yekê, divê Kurd heta ji wan tî bi helimî û selimî, li gorî zanist û rê û rêzîkên politikayên reel tevgerin. Ya din jî, bi ya min ev jî her tiştî girîngtir e, di vê pêvajoya girîng de divê hemî Kurd çî dilki çî devki bo Teverga Azadiya Kurd bawerîyek xurt bihewînin û bi devki jî ragihînin xêrnexwazan. Gere baş bê zanin ku di erdnîgariya herî tevlihev de têkoşîna li dijî welatê herî bi hêz ê rojhîlata navîn, berxwedana li hemberî artêşa duyemîn a NATO'yê tişteke ne hêsane.

Ev hêz, ji çek û rextan bêhtir ji meji û metodolojiya zanistî û ji evîna bo Kurd û Kurdistanê pêk tî. Bi bi zanetî min Kurdistanê xist rêza dawîn; ji ber ku Kurdistanêkê bê Kurd-aqûbeta Kurdistana Sor di bira me de ye-tu car nabe Kurdistan.

Ki çî dibêje bila bêje iro Kurdên Bakûr digel serkeftîneke berbiçav a ev sih salên dawî hê jî bi xetereya bişavtinê ve rûbirû ne û berdewamiya ziman û nasnameya xwe ya sedsala XXII'yan misoger nekîrîne. Nasnameya tevahiya Kurdan hê di fermiyetê de Tirk e û kesên dîrî siyaseta Kurd bi dilki û bi navki bi zimankî jî berê berê devediguherin dibin Tirk. Ez dibêim, heke Dewleta Tirk, iro-sîbeh werê ser îmanê û destûr bide û bêje "Kurdên dilxwaz di qeyda nîfûsê de êdi dikarin xwe wek Kurd bîdin nivîsandin" ên ku dê li nasnameya xwe xwedî bikin disa dilxwaz û aligirên Teverga. Xetereya mezin jî ev e ku iro AKP, bi politikayên xwe yên xapîno baran, dike bi hin guherînên biçûk, gelê Kurd ber bi xwe ve bikişîne û wî jî bandora Teverga Azadiyê bi dîr bixê û serhildana dawîna a Kurdann gor bi gorî bike.

Heyfa min tî wê heyfê ku hin tevger û partîyên biçûk ên Kurdan, çavên xwe jî ve xetereyê re digirin û bi hinceta ku ew jî Kurdistana azad dev berdaye, êrişî Teverga Azadiya herî bi hêz, tevgera tekane ya xwedî gotin û Azadiyê "bi dev û destberdana jî Kurdistan a azad" mafdar in?

Ez li ser ve yekê hûr û kûr rawestiyam û di dawîya dawîn de gihîştîm ve encamê: "Ev rexne, bi qasî ku ji hesabnezaniyê, ji kesayetiya şikestî, ji "bi xwe nebawerbûn û xwe biçûkdîtina hin Kurdan pêk tî.

Em van sedeman yeko yeko binirxînin: Hesabnezani: Bê nasname û bê zîman, Kurdên misilmanên kurên misilmanan di nav Tirk û Ereban misilman de dihelin wînda dibin. Divê Kurd, bi lez û bez, zîmanê xwe, bo hemî Kurdên Hêj li ser xwe mayî, bikin zîmanê perwerdehiyê û bikaranîna wî ya di qada fermiyetê de bi dewletê bidin qebûlkirin. Min berê jî çend caran nivîsîbû; disa dibêjim û dipîrsim, ji kerema xwe bidin ser hev, hesab bikin ka "ji 400 hezar Kurdên 70-80 salî yên di salekê de diçin ber rehma Xwedê" çend hezar kes bi rêk û pêk bi

Tirkî dizane? Ji 500 hezar dergûşên her sal ji dayik dibin çend kes dê bi Kurdî bizanibe?

Gelî dijberên zimandîrêjî, biha û berdêl û zirara salekê çî qas e; kete serê we? Hûn salê jî nîfûsa xwe çend sed hezar wînda dikin? Heta ku Kurdistana azad a di dilê hemî

Kurdan de dijî ava bibe, dê ev zaiyat bigihîje çend deh milyonan? Heke hûn bi xwe, ji terefê Xwedê de bê zîman û bê nasname heta wê serdemê li ser Kurdayetiye bimînin

ji (?), dê hûn Kurdistanê bi ki û kê ava bikin? Aqil û hişê we ve yekê dibire? Kesayetiya Şikestî: Kurd di dirêjahiya sedsalan de ji bo "Kurdistanekê Azad" bi dehan serhildan û rapêrinan dan destpêkirin û di tevahiyan de şikiyan. Ew carinan ketin

ber bextê bêbextan xapiyan; serokên wan ên dilsoz lê, ji dilê xwe sax, bi rojan bi kindirê reş ve darvekî li meydanan man, disa ji kes negihîşt hewara wan... Kurdên bê rexistin û bêhêz û ê bo Kurdistanê bikira çî şerek!"

Ev kesayeti di nefî û canê Kurdên dijberên Teverga Azadiyê de hê jî dijî. Ew ji xwe dernaxin, napejirînin lê rastî ev e ku;

"neyarên xwe ew qas mezin dibînin ku hêvî nakin ku bikaribin jê tişteke bistînin."

Ev yek bo wan xewn û xeyal e; bi qasî stêrkên ezmanan dîr e.

Çawa ku kesên tiral, di nav nivînan de zêran xeyal dikin, tu car bi kûpeki bi du kûpan qail nabin û dixwazin bibin xwedî ocaxekê bê serî û bê bîni ya zêran, ew jî bê ku bixebitin, tişteke berbiçav bikin

Bi xwe nebawerbûn û xwe biçûkdîtî: Di zanista psikolojiyê de mijarek bi navê "transfera kesayetiye" heye ku pîr caran tî serê mirov. Bi taybetî kesên xwedî derûniya xwe biçûkdîtî û bi xwe nebawerbûnê, an xwe dikin şûna kesên ji xwe, an jî kesên ji xwe dikin şûna xwe. Bi her awayî û di her şert û mercan de gava ew, bi kesên biyanî re dikevin ber qayîşê û tîdikoşin, hê di serî de xwe û aliyê xwe tîkçûyî ferz dikin. Çawa ku ew xwe lawaz û bê hêz û nezan dizanin, dibêjin kesên ji wî jî (xîzm, heval, kesên ji heman netewî) wek wî ne. Ev transfer carina dibê hestiyarî û dilşewatî; carina jî hesûdî, neyartî, çavnebarî... Wek minak kesekî di leşkeriya di artêşa dagirkeran de ji çawîşekî jî bitirre, gava merivekî wî yê bi tîra xwe xwedî paye, bi generalekî re bikeve tîkiliyê, ew wî-dê bê serê wî/wê. (Ev general e general, gidîno! Ew ê derdikeve pêşberê

wî Keremê me ye. Generalê bi tîra xwe mezin, jîr û leheng, bi nav û bi nîşanên reng bi reng; ê din bi tenê Kerem... Kerem teqez diçe çemûçem...)

Heke çavnebarî û mixeneti hebe, wê demê ew lawaziya wan wek "neyartî" xwe dide der. Ev derûniyet di kesayetiya hin Kurdên dijber de aşkera dixuyê. Ew li ber dewletê xwe ewqas lawaz û biçûk dibînin, bawer nakin ku tu kesekî jî wan, an wek wan, bikaribe serî bi dagirkeran re bigerîne, biserkeve.

Ev tîrs û xof a di dilan de, di qada tîkoşinê de ewqas dike giranî, kesayetiya şikestî, ji bo tekoşer û serokên "ji xwe" hema bêje weha difikire:

"Ew li ku berxwedana li hemberî dewletê li ku? Teqez li ber dewletê çok danîne, ber çavên wan wek çiyayê Agirî dixuyê tu car li ber xwe nadin-nedane jî. Bi ser de ew li ber tekoşer û serokên dilsoz tim û tim dibin asteng û bi nezani di eniya dijmin de cih digirin.

Lê beramberî van tesb analîtîk dikare rastîyan bi xwe bide pejirandin û bi ya hestên xwe na, bi ya aqil û zanîstê bike. Bi taybetî kes û kesayetiyan dijber ên ku xwe wek Kurd û Kurdisani dihesibînin û di nav tevgerên Kurdistani de cih digirin divê li ser derûniyeta xwe rawestînin û mejiyê xwe zelal bikin.



# Navneteweyî

## Gelo şerê bi El-Qeîde de cepheya nû Yemen e?

Emerîka û Brîtanya Balyozxanên xwe li Yemenê girtin

AMED (Pêşketin)

H Doh DYE û Brîtanya balyozxaneyên xwe yê Yemenê girtin. Tê diyar kirin ku balyozxane ji ber El-Qaîdeyê hatine girtin. DYE îdda dike ku hikumeta Yemenê bi têri xwe li dijî El-Qeîde şer nake. Bi rêvebirîya Yemenê hevdişandinê derbarê meseleyê de

didomin lê wisa dixûye ku Yemen dikare bibe eniyekê şerê ku DYE li Iraq û Efxanistanê birêvedibe. Li gor çavdarên siyasî dibe ku di demke nêzik de ser El-Qeîdeyê oprasyonên berfireh a hevbeş di Efxanistan, Pakistan, Yemen û Iraqê dest pê bike. Her wiha pêşveçûnên dawî wek nişaneyên amadekariya êrişê ser Iranê ji tê nirxandin.

HAWAR NET.com



### Mûsevî: Ez amademe jiyana xwe bikim qûrbane Reformê

Rêberê mixalefeta Îranî Mir Hûsen Mûsevî dibêje ew amadeye jiyana xwe bike qûrbani ji bo reformê û dawa li hikûmetê kir dest ji bizavên tepeser kirina piştevane opozisyonê berde. Çavkaniyêke reformistên Îranê yê ku ew demek e xwepêşandanan li Îranê saz dikin, weha da xuyakirin, ku hêzên ewledariya Îranê bêtirî 1300 kesan girtine.

### Serokê Afganistanê ji biryara perlemanê ne razî ye

Peyivdarekê serokê Afganistanê Hamid Karzai diyar kir ew ne razî ye ku perlemanê 70 ji sedê ji destnişan kirî yê kabîna wî înkâr kirin. Wehid Omar li konferansa nûçeyan li Kabulê li roja Yêkşembê pênasî kir ku biryara perlemanê jibo serok Karzai yêka ne baş bû. Omari got bala serokî hate kişandin û helbet ew ne keyf xweş e. Lê wî got Karzai rêz jibo desturî heye û ew rêzê li desthelata perlemanê digirî.

### Li Tirkîyeyê li Bîlecîkê du trenêna rêwîyan li hev ketin

Li bakûra rojavayê Tirkîyeyê li parêzgeha Bîlecîkê du trenêna rêwîyan li hev ketine. Li gor ragihandina wezîrê veguhastîne di encama qezayê da yek kes miriye û du kes ji birindar bûne. Tê ragihandin, ku makinîstê trenê, ku qeza hema ji ber sucê wî qewimiye, jiyana xwe ji dest daye û du xebatkarên rêhesin jê birindar bûne.

### Efxanistan wê demeke dirêj bê hukûmet bimîne

Metirsi heye, ku Efxanistan ji bo demeke dirêj bê hukûmet bimîne, û ew yek bibe sedema hê giranbûna rewşa stratêjîk ya wî welatî. Der barê vê yekê da nûnerê taybet ya sekreterê NY li Efxanistanê Kay Êydê aşkere kir

### Li Îranê 11 polîs hatine kuştin

Li gor agahiyan li Îranê di encama pevçûna di navbera mişextvanên narkotîk û polîsan da 11 polîs hatine kuştin. Di pevçûnê da her wisa çar mişextvan ji mirine.

### Li cîhanê zêde ji milyardek însanên birçî hene

Berpirsek plana cîhaniye xwarekê ya NYê duh bi daxûyaniyekê qedrê wan welatan girt ku di warê têkoşîna li hemberê birçîbûnê li cîhanê hevkarîyê dikin û desnişan kir ku zêde ji milyardek mirov li cîhanê birçî ne.

## Maça voleybolê bû cihê qetlîamê



Li Pakîstanê musabeqeyek voleybolê de erîşek întixarî çêbû û li erîşê de 92 kes jiyana xwe dest da.

Li Pakîstanê vê carê xwîn têkilê sporê bû. Li bakurê rojava ê Pakîstanê musabeqeyek voleybolêde xwekuştîyek pê bombeyî bombeyek li xweve grêdayî tekand û teqînê de 70 kes mirin. Ji ber hişkîya teqînê de sibana da salona sporê hilweşiya. Li gor agahdarkirina rayederan ji kêmasîve 92 kes mirin e. HAWAR NET.com

## Çîn trenêna herî bilêz di 4 mehan de çêkir

Çînê trêna lezgîn çêkir û lezgîniya trêna digehêje di seetê de 394 km.



Trêna herî lezgîn çînê çêkir. Trêna hezar km 3 seetan de diçe. Çînê diyar kir ku trêna en lezgîn çêkirine û doh sefera xwe ya pêşîn pêk anin. Wek tê zanin di dinyayê de gelek dewletan trêna lezgîn heye. Heta niha trêna herî lezgîn ya Japonya û Fransa bu. Çînê ev pişekî ji Japonya û Fransa wê bistine. Hate diyar kirin ku sistema trenê di nava 4 mehan de hatiye tamam kirin. HAWAR NET.com

HAWAR NET.com

kurdistan zanyarî zaxo amed duhok mîrdin batman hewlêr sine agirî xaneqîn cizir erxani efrin wan colêmerg erdlîş bedlîs sêrt şîrnex mehabad riha qamîslo kerkûk silêmanî nûçe idîr kîrmançan tîrîn

trên perwerîna wasîntîngtoo cîhan stambol berlîn paris şam qudûs tokyo tel avîs mekke tahrîr bûyer teknolojî aktuel zanzîst zîman huner çand rojev medya şîrove

zanîn xwe nasîn e...

**HAWAR NET**  
hawarnet.com



# "Dê çekên nuklerî bêne kêr kirin"

Wezîrê derve ya Rûsyayê diyar kir ku Sergey Lavrov bi peymanê STARTê ku bi DYE re were îmze kirin wê bibe sedema kêr bûna çekên nuklerî.



**MOSKOW (Pêşketin)**  
Wezîrê karên derve ya Rûsyayê Sergey Lavrov di hevpeymana bi ajansa informasyona Interfaksê ra got, ku guftûgoyên li ser peymanê nû ya Çekên Stratejîk yên Êrişkar nişana wê yekê ne. Bi tevî wê jî di navbera herdu aliyên da, nêrinên cuda hene. Hinek helwestên Amerikayê

nayên famkirin, Lavrov got, ku mabest ew e, ku Amerika piştgirîya rejîma Saakaşvili dide û alikariya leşkerî dide artêşa Gurcistanê. Li ser armanca sereke ya wezareta karên derve ya Rûsyayê di sala nû da, Lavrov got, ku armanca sereke

, xebata hevkarîya stratejîk bi YE ra û di hola HDS dabinkirina pêvajoya integrasyonê ye. Li gor Gotinên Lavrov Yekitiya Gumrukê ya navbera Rûsya, Belarûsya û Kazaxistanê ra tevgeriya diplomatîk ya efektîv pêwîst e.. HAWAR.NET.com

## Li Brezîlyayê felaket: 47 kes mirin

Di feleketa li eyaleta Rîo de Janeiro ya Brezîlyayê ya ji ber baranê qewimî de 47 kesa jiyana xwe ji dest da

RÎO DE JANEIRO - Rayedaran diyar kir ku di hezaza ku li Agra dos Reisê heriki de cenazeyên 27 kesa ji bin heriyê hatin derxistin. Gelek mal jî di bin heriyê de mane gelek kes wînda ne û 10 kes jî birindar hatine rizgarkirin. Ji bo kesên di bin heriyê de mane xebatên rizgarkirinê didomin.

Hat gotin ku ji ber hezaza rabûye dar û direkên elektrîkê jî bîni ve hatine hilkişin. Eyaletê di agahiyên rojek beriya vê de aşkera kiribû ku 20 kes mirine. Lê agahiyên herî dawî destnîşan dikin ku hejmara miriyan bûye 47 kesa. Fikar heye ku ev hejmar zêdetir bibe. A.WELAT

## Serokê YE'yê a dewra nû êdî Spanya ye

Spanya serokatîya YE'yê ji Swêdê stand



**MADRID (Pêşketin):** Serokwezîrê Spanyayê Jose Luis Rodriguez Zapatero hedefên xwe wiha eşkere kir, "ji bo başa bûna aboriyê tekoşin, temamkirina guhertina saziyên li gor peymanê Lizbonê, serdestiya politîqaya dervayî û frehkirina azadiya welatîyîya YE'yê ye". Spanya diyar kir ku giraniyê bide xelas bûna qrîza aboriyê. Wek tê zanin ku Spanya nav YE'yê, digel rêjeya betalîya 18 salîyan re a ji dewletên aboriya wa en xerabe. Spanya hem jî ber nav dewletên YE'yê dewletan en pir misurman te de heyî û hem jî ber tecrûbeya çareserkirina pîrsgîrêka Qatalan û Baskan ji Kurdan jî wek hevîyek e.. HAWAR.NET.com

### KURTE NÛÇEYÊN JI ROJEVA ABORÎYÊ



#### Gelo di dorê de Japonya heye?

Deynê kamûyê a Japonyayê serê hikumeta Japonyayê diêşine. Li gor saziyên pîvandina krediyê jî bo ku Japonya pileya xwe ya krediyê biparêze divê deynên xwe bigre bin kontrolê.

#### GM dixwaze deynên xwe bide

Şirketa otomotivê a DYE'yî General Motors diyar kir ku ew dixwazin û plan dikin ku heta meha heziranê deynên xwe yê 8 mîlyon dolarî a hikumetên DYE û Kenadayê bidin.

#### Li Romanyayê IMF xwest û 80 hezar memûr bêkar diminin

Hikumeta romanyayê li ser daxwaza IMF'yê jî bo teserrûfê da ku budceya 2010'an were peyda kirin biryar da ku 2010'an 80 hezar memûr jî kar bêne derxistin.

#### Li Tirkîyeyêji dervey anîna hingivê hate qedexekirin

Tirkîyeyê, li ser serlêdana Yekitiya Mêşvanên Tirkîyeyê (TAB), biryar girt ku anîna hingiv a ji welatên cînar qedexe bike. Endamê Desteya Rêveberîya TAB'ê Fahri Saylak, diyar kir ku hingivên ji Îran, Iraq û Suriyeyê dianîn Tirkîyeyê resen nebûn û wan hingivan zirarê dida tendurîstiya mirovan.

#### Elmanya: Yewnanistan nikare ji IMF'yê alikari bistine

Wek tê zanin Yewnanistan di nava krîzeke aboriyê de ye. Ekonomîya herî mezin a Ewropayê Elmanya diyar kir ku nabe ku welateke Yekitiya Ewropayê ji IMF'yê alikari bistine, tiştêki wisa ne mimkune.

#### Rêjey helawsan le başûrî Kurdistan le 70% ye

Bepêyî pirojeyek ke rêxirawî ask bo çawdêrkirdinî helawsanî aburî lekurdistan behawkarî rêxirawî CEPE amadey kirdibu, derkewtwe rêjey helawsan le heremî kurdistan degate 70%. AJAN SAN

DI KURDO de her tişt li ber destê te ye...

Ename, sohbet, listik nûçe, video, kêf, agahî û zêdetir...



Kurdistan Dergûşa Şaristaniyê Roniya Pêşarojê HAWAR.NET



# Zanist û Teknolojî

## Firoatina e-pirtûk "Kindle" rekor şikand

Firoatina e-pirtûkên a di malperê firotinê Amazon'ê firoatina pirtûkên normal care yekem paşxwe ve hişt.

AMED (Pêşketin)

Proja noelê kiriyarê Amazonê tercihen xwe ji pirtûka normal ne danin, tercihen xwe ji danin.

Hat diyarkirin ku 14 berfenbarê de firostina E-pirtûkê "Kindle" 9.5 milyon çêbu û pê ve firostina elektropirtûkê reqor şikand.

Ev ji tê wê menê ku saniyê de 110

Elektropirtûk hatiye firotin

Li gor niviskaran û pirtûk firoşan salên bê de e-book wê cihê pirtûkên kaxiz bigire. Bi saya wan amûran rojname ji dikarin bêne xwendin.

Dibe ku ev amûr kerî Kurdan ji were û weşangerên Kurd ji problema çap kirin û belav kirina pirtûk, rojname û kovaran xelas bibin.

HAWAR.NET.com



## Kêmasîya vîtamîna D rîska krîza dil û mêjiyê zêde dike




AMED (Pêşketin): Li gor lêkolînên zanyarên Amerîkî kêmasîya astê vîtamîna D di nav xwîna mirovê de xetera krîza-celta dili û mêjiyê zêde dike.

Kesên ku astê vîtamîna D dinav xwîna wan da gelek nizme pê ji 77% ji wan dimirin û ji 45% ê wan kesan de problemên derdikevin holê û ji 78% kesên ku krîza mêjiyê derbas dikin kesên ku astê vîtamîna D di wan de ne normal e. Li bîngehê tenduristiyê Intermountain li Utah, berpîrsyarek di daxuyaniyekê

de diyar dike ku ew lêkolîne lêkolîneka nû û nemaze ye, jiber ku tîkîliya li navbera kêmasîya vîtamîna D û girîftên dili heta niha bi başî nehatine piştrast kirin.

Zanyarên li saziya Intermountain ji bo salekê çavdêriya 27 hezar û 686 kesên dinavbera jiyê 50 salî û mezintir kiriyê, yê ku di nav salekê de tu problemên dili nebûne û jibo wan diyar bûye ku astê vîtamîna D dinav xwîna wan de bi rêya pêra giheştinê bijîjkî bi berdewamî hatiye tomar kirin. HAWAR.NET.com

## Di 10 salan de 10 kifşên girîng



AMED (Pêşketin): Qada zanistî roj bi roj îmzeyê diavêje bin karên dîroki. Di deh salên dawî de gelek keşîfên dîroki pêk hatin û di jiyana mirovan de guherîn çêkir. Minak em 10 bûyerên ku herî zêde bala mirovan kişand, li hemû cîhanê deng da. Di 10 salên bûyerên ku herî zêde bala mirovan kişand wiha bûn;

### Ceribandine Hadona mezin

Di lêkolîna mezin a ku bi 10 milyar dolaran pêk hat, wekî ceribandina herî mezin a sed salê tê peşkirandin. Wiha tê hêvîkirin ku bi riya li hev qelibandîne, ew teqîna mezin a 14 milyar sal berê di encamê de cihan hat a vakirin, bê dubarekirin.

### Di hureya kok de kifşa mezin

Zanyar Şînya Yamanaka di sermaweza 2007'an de îspat kir ku bîyê embriyoya mirovan dikare hucreya kokê biafirîne. Yamanaka, ev ceribandina xwe di ser mişkekê de îspat kir.

### Ceribandina tevgera mekanîk

Zanyarên Zanîngeha Nort Carolina, hin elektrotan di mejiyê meymûnekê de bi cih kirin û fermandan meji gihiştandin kompîturê.

### Gerstêrka hacûc Erîs

Ev gerstêrk, ji aliyê ra vekirinê de zanyarên feza yê kir du beş. Paşê biryar hat dayîn ku ev gerstêrk di pola 'Gerstêrka hacûc' de bê bi cih kirin.

### Gerstêrkên derî pergala rojê

Di salên 90'î de hin niqaşên wekî ji bilî cîhanê ji zindî hene çê bûn. Di serî de çend gerstêrk tenê hatin dîtin lê piştî salên 2000'î zêdetirî 20 gerstêrkên din ji hatin dîtin. Lê niha gerstêrk 'bi sedan' tînen hejmartin.

### Tasaserî ya 7milyon salî

Li çolên Çad ên Afrikayê di sala 2001'an de hestiyê serî yê mirovan a 7 milyon sal berê hat dîtin. Hestî wekî 'Toumai' hat bi nav kirin

### Kopyekirin

Serdema Kopyekirinê, ev pêvajoyê di sala 1997'an de bi kopyekirina mihekê bi navê Dolly hat dest pê kirin. Piştî Dolly, di sala 2000'an de meymûnekê ji hat kopyekirin. Li gelek cîhanê, gelek lêkolîner sewalên wekî çêlek, hesp, bisik û hwd. kopyekirin û bi ser ketin. Di sala 2001'an de çêlekekê û di sala 2009'an de ji deveyeke hat kopyekirin.

### Dîtina avê ya li marsê

Li gerstêrka sor Marsê dîtina avê hat erêkirin. NASA diyar kir ku erebeya wan a feza yê ya bi navê Phoenix, ne ku tenê avê ditiye, temasê ji kiriyê. Disa hat diyar kirin ku heman erebe, li hin cîhanê gerstêrkê yê ku berê ne hatiye dîtin ji avê ditiye.

### RNA'yên mîkro

RNA'yên mîkro cara yekem di sala 1993'yan de hatin dîtin lê navê 'RNA'yên' mîkro di sala 2001'an de girtin. RNA di nav laşê mirov de gelek girîng e. Heke ku li cihê RNA'yên laşê rawestî, li wê herêmê nexweşî derdikevin holê.

### Baxçeyê sewalan Genom

Projeya Baxçeya Sewalan a Genomê, xebateke navneteweyî ye. Wisa tê texmîn kirin ku di xebatên di vî baxçeyê de, tomarkirina DNA'yê dê hêsantir û erzantir bibe.. AZADIYA WELAT

## Giranî li her derê cîhanê ne eynî ye!

Peyka Goce a Ajansa feza yê a Ewropayê dever dever nexşeya kêşaed a rûyê erdê derxist. Peyka Goce a Ajansa feza yê a Ewropayê dever dever nexşeya kêşaed (yerçekimi) a rûyê erdê derxist. Agahiyên pê peykê tê rêkirin nexşe hatiye amadekirin. nexşe Ji edrhêjanê heta oşinoxrafîyê gelek qadan de wê bê karkirin.

Li gor lêkolînê giraniya mirovan li her deverê ne wek heve. Bi wê nexşeyê girani li ku girane li ku sivik e hate zanîn. Lêkolîn di bûltena American Geophysical Union's (AGU) de hate weşandin. HAWAR.NET.com

## Av birçîbûnê dereng dixê

Gelek feydeyan avê hene. Li ser wan yekî din ji zêde bû-Encamên lêkolînê nû nişan didin ku vexwarina avê berî her demeke xwarekê birçîbûnê kêmkirî.

Li gor lêkolîneke vexwarina niv lêtir av berî her demeke xwarinê birçî bûnê kêmkirî Vexwarina avê berî xwarina taştê 75 kaloriya kêmkirî

ku di salê de dike 3 Kg dohin. HAWAR.NET.com

## Bo tedawiya şîrofrenî kefşa nû

Zanyaran ji bo ku nexweşîya şîrofrenê baş fêhm bikin û rêbazên tedawiye yê nû bibînin mişkên şîrofrenê çêkirin. Li DYA'yê ji Fakulteya Tibê ya Georgia Dr Mei Lin û ekiba xwe, gena mişkan a ErbB4 derxist. Piştî ku ji mişkan ev gen hate derxistin, di mişkan de hereketên şîrofrenî derket holê. Bi taybetî di sewalande heycan, fikar û nerehetî zêde bû û her wiha di hijê wan de ji pîrsgirêk derketin holê.

Mei Lin encama

lêkolînê di kovara PNAS a Akademiya Zanistên Amerîkayê de weşand.

weşanên nûçe - rojname - tv - kovar - radyo

Hemû linkên ji medyaya Kurdî.

Cihê we yê destpêkê!

Bixwînin - Zindî Temaşe û Gûhdarî bikin  
medyayakurdi.com





## Çand û Hûner

## Penelope Cruz di "Hembêz kirinên şikestî" de...

AMED (Pêşketin)

Zilameke ku di tariyê dinivisine, diji û tariyê hez dike. 14 sal berê qezayeke ku di girava Lanzarote de pêk hatiye li ger çavên xwe jina jiyana xwe ji winda kiribû.

Piştî wê rojê bi navê xwe ya kod Harry Caine

nivisandina çirokan domand. Û rastihatinên ecêb...

Penelope Cruz wek listikvanê sereke dileyze. Broken Embraces, ne wek filmeke klasik a Almadovar e.

Ji vê filmê neminin, çî bi DVD an jî ji internetê peyda bikin û temaşe bikin.

HAWAR.NET.com / SINEMAKURD.com



Rêzefilma Med Man

## Fîlm û rêzefilmên salê

Kovara Time film û rêzefilmên salê yê serketî hilbijart. Di listeya "10 filmên herî serketî yê salê" de animasyonan her sê rêzên pêşîn bi dest xistin û filmên zindî li dû xwe hiştin.

Time wekî filmê herî serketî yê salê "Prensê û Beq" (The Princess and the Frog) ku filmê animasyonî ye wekî filmê herî serketî di rêza yekemîn de hilbijart. Di beşa rêzefilmên de jî "Mad Men" bû yekemîn. Li gor listeya di kovarê de hat weşandin di rêza duyem a filman

de disa filmê animasyonî heye: "Li jor binêre" (Up). Di rêza sêyem de jî filmê animasyonî "Fantastik Foks" (Fantastic Mr. Fox) çih girt.

Li gor kovara Time filmên din ên herî serketî: "Kêmina Mirinê" (The Hurt Locker), "Aqil li hewa" (Up in the Air), "Qûrdeleya Spi" (The White Ribbon), "Zilameki bi tenê" (A Single Man), "Der barê bajar û zemanê de" (Of Time and the City), "Herêma Qedexê 9" (District 9), "Daxwaza Xwinê" (Thirst).

## Di 2009'an de muzîka Kurdî



AMED (Pêşketin): Çend pêşketinên girîng û hin albûmên Kurdî ku 2009'an de derketine ewin; -Hunermendê ciwan a jî başûrê Kurdistanê Herdî Selah albûma xwe ya nû ku ji 15 stranên pêk tê hate weşandin.

-Sandirellaya Haniyê derket -Deniz Deman ku jina hunermendê navdar Diyar e bi albûma xwe ya nû a bi navê "Dûrî" derket pêşberî hezkiriyên xwe.

-Enstituya Kelepûrê Kurdî ku li başûrê Kurdistanê kar û barên xwe digerin, elbûma hunermend Gulbuharê derxist -Koma Bajar, bi Kurdî Folk/Rock albumek bi navê "Nêz be" derxist.

-Hunermendê mezin Aram Tigran ji nav me koç kir. Her wiha albûmeke nû ya Aram Tigran hate weşandin.

-Pirtûka nû bi zaravayên kurmancî û soranî yê Kurdî hate çapkirin a bi navê "Muzîka Sarayê ya Kurdî" ji bilî çanda dewlemend a dengbêjiyê, di heman demê de aliyê muzîka kurdî ya gel ji radixe ber çavan.

"Koma Ferec" ku ji hêla 4 ciwanên Colemêrgî hate damezrandin û li Tirkîyê "Yekemîn Koma Heavy Metala Kurdî" tê nasin albumek nû derxistin

-Albûma nû ya Koma Kamkaran ya bi navê "dûr ta nêzik" derket -Albûma kurdî ya Hozan Şexo a binavê Dengê Avê ji hêla Ses Plak ve hate derxistin

-Hunermend Ali Baran albûma xwe ya bi navê 'Çel Awaz' derxist.

-Kovara kurdî ya muzîkê Do-Jîn, ku bi armanca niqaşên pêşketinê li pêşiya muzîka kurdî veke dest bi weşane kir.

-Hunermend Sipan Xelat piştî 3 salan albûma xwe ya nû ya bi navê "Bêrî" gihêşt hezkiriyên xwe û belavkirin.

-Stranbêja hip-hopê Kurdî Serhado ku bi albûma xwe pêşi gellek deng veda bû niha bi albûma xwe ya duyem derket pêşberî hezkiriyên xwe. Navê albûma nû ya Serhado "Xelaya Evin" e.

-Stranbêjê kurd Kemalê Amedê ku dengê wî dişibe dengê Şivan Perwer bi albûma "Kela Zilmê" ve de derkeve pêşberî hezkiriyên xwe.

-Her wiha albûmên yê Kurdî li bakûrê Kurdistanê, bi taybet bi dehan albûmên nû ji Kurdistanê azad û her wiha li Ewropa û ji perçeyên din tevli arşîva muzîka Kurdî bûn. Arşîva MUZIKKURD.com

## Shakespeare êdî bi kurdî ye

AMED (Pêşketin): Weşanên Lisê soneyên William Shakespeare bi kurdî çap kir. Berpirsyarê weşanê Lal Laleş, diyar kir ku ew ê pirtûka kurdî ya Shakspear ji Wezîrê Kulturê Ertugrul Gunay û Parlamentoya Tirkîyeyê re ji bişînin.

Weşanên Lisê ku weşandina 100 berhemên qerasese yê klasîkên cihanê weke armanc daxe pêşiya xwe, di serî de soneyên William Shakespeare, 8 pirtûkên mîna roman, şano û lêkolînê ji weşanê re amade kir. Berpirsyarê Weşanên Lisê Lal Laleş, bi bir xist ku bi amadekirina soneyên Shakespeare weşanxaneyê gaweke girîng avêtîye û wiha got:

"Shakespeare weke ku hûn dizanin nivîyê edebiyata cihanê ye. Em geleki serbilind in ku ew nivîyê wêjeya cihanê bibe kurdî. Weke destpêk ji weşanxaneyê me Lis bi hemû soneyên shekspaer rêza berhemên giştî ya Wiliem Shekespeare da destpêkirin.

Wergêr û amadekarina wê Kawa Nemir kiriye. Ev berhem bi du zimanan e, bi inglîzî û kurdî ye. Ev wergêr de di heman katê de, projeya me ya mezin a wergêrandina wêjeya dinyayê xurt bike. Ev gaweke geleki girîng e ji bo wergêra edebiyata cihanê."

Lal Laleş, angaşt ku sê romanên wan ên niha li ber çapê ne, de di warê qelîteya wêjeyê, tevîn, stratejiya vegotinê û bikaranîna ziman de, di romana kurdî de merheleyeke nû bi xwe re binin. Berhemên ku li ber çapê ne ev in: Bavê Nazê / Dara Pelweşiyayî, Yunus Eroglu / Otobês, Şener Özmen / Pêşbaziya Çirokên Neqediyayî (roman), Kurd / Destpêka Dîroka Etnîkî ya Gelê Kurd / O. L. Vilchevskij (Wergêr: Ziya Avcî) Êzdiyati / Oleke Hê ji Nenaskirî / Tosinê Reşid (Lêkolîn), Mirin Di Xewê De Bû / Bêpar / Cuma Boynukara, Pevşabûnên Şin / Ahmet Roniar / Shakespeare / Hemû Sone (Amadekar: Kawa Nemir / Helbest)



AMED (Pêşketin): Malpereke sinemayê filmên herî baş a 10 salên dawîn hilbijart. Liste wisa ye;

- 1- Ji nû ve - Eternal Sunshine of the Spotless Mind (Michel Gondry, 2004)
- 2- Mulholland Drive (David Lynch, 2001)
- 3- Dema Evinê - In The Mood For Love (Wong Kar Wai, 2000)
- 4- No Country For Old Men (Coen Brothers, 2007)
- 5- Memento (Christopher Nolan, 2000)
- 6- Çiyayê Brokeback (Ang Lee, 2005)
- 7- The Dark Knight (Christopher Nolan, 2008)
- 8- Spirited Away (Hayao Miyazaki, 2001)
- 9- Crouching Tiger, Hidden Dragon (Ang Lee, 2000)
- 10- Donnie Darko (Richard Kelly, 2001)
- 11- The Lord of the Rings: The Return of the King (Peter Jackson, 2004).



## Kizil: Em dixwazin di dîroka kurd de cihê xwe bigrin

”Em di xebatên xwe de zimanê Kurdî esas digrin”

Ramazan Kizil ji sporKurdê re wiha aixifi; Dalkurd Kulûbek futbolê ye, ya Kurda ye. Ev herema ku em lê dijîn navê wê Dalarna ye. Wekî bêjin Kurdên Dalarnayê, me navê heremê bikaranîye. Me di sala 26-9-2004 an de Dalkurd ava kir li bajarê Borlänge ya Swêd ava kir. Em zimanê kurdî esas digrin, lê di xebatên gisti de, ji ber ku biyanî ji di nav me de hene em zimanekî hevpar bikartînin ev ziman ji swêdî ye. Amblema me rengê ala kurdistanê ye, lê sembola Dalarnayê ji di nav de heye. Cilên me ji rengê ala kurdî ne. Ev ji bo me tisteki giranbuha ye

, ku em ciwanên kurd di bin ala kurdî de tînin cem hev. Em gelek kêfxwes in ku di bin ala kurdî de bi takimên biyanî re derdikevin musabaqeyan 2010 Emê di liga Swed a 1 de bileyizin (Dalkurd) 18 nisan 2010 maca xweyî pêsi dileyizê. 2011 Super 1 - 2012 super Lig Hedefa me ew e ku em bibin kulubeyek bas ku li ser navê hemu kurdên Ewropa bilizin û serkeftinên bas bidestbixin. Em li gorî pêwistiyên serkeftinê xwe organîza dikin û tistên pêwistbin tînine cih. Di despêkêde zahmetiyên me ê zanebunê hebun lê niha tunene, bes zahmetiyên me bawerîye.



## 2010 wiha hate pêşwazî kirin...

Li herderê Cîhanê, cûr be cûr pîrzbahî ya sala nû hebû

Li Kurdistanê û li welatên din millet derketibûn qada. Li Hewler, gel li ber kela bajêr bi fişekên hewai, bi çoş^dilan girtin û sala nû pêşwazî kirin. Her wiha li Silêmani ji pîrozbahî hebû.

Lê belê li Silêmani baran ji hebû, dişa ji gel derketibû qadan. Li Rio de Janeiro Payitexta Breziya, li plaja (perav) Copacabana ê nêzîkî 2 milyon kes amadebûn û bi çoşêke mezin, bi fişekên hewayî sala 2010 'an pêşwazî kirin. Mamed ê Dêrîkî



## Tîma Serwer Şampiyonê Boksê yê Kurdistanê ye

Tîma Serwer a Kerkûkê, Şampiyoniya Boksê ya Herêma Kurdistanê qezenc kir. Boxing Şampiyoniya Boksê ya Kurdistanê ku du rojan li Salona Sari ya Paytext Hewlêrê pêk hat, bi dawî bû. Serokê Yekitiya Boksê ya Kurdistanê Zeyîd Mahmut, derbarê pêşbaziye de ji AKnews'ê re axivî û wiha got:

“Di nava listikvanan de qayîşkêşaneke pir mezin hebû. Hakemên navneteweyî ku ji Bexdayê hatibûn, pêşbaziye isal bi rê ve birin. Di şampiyoniya ku bi giştî 8 tim beşdar bûn de, Tîma Serwer bi 30 pûanan bû yekemin, Tîma Pêşmerge ya Silêmaniyê bi 15 pûanan bû duyemîn û Tîma Keywan ji bi 14 pûanan bû sêyemîn.”

## Dîroka nêz a Kurdistanê; di meha Çile'yê

Tevgera duyem a Dêrsimê Destpêkir 01 Rêbendan 1959

Rêveberê HADEPê a Wêranşehrê Fethî Yildirim ji aliyê kontrayên dewleta Tirk ve hate kuştin 05 Çile 1995

Kurd Tealî Cemiyetî hate damezirandin 10 Çile 1918

Hunermendê Kurd Mihemedê Mamlê, jiyana xwe ji dest da 13 Çile 1999

Helbestavê Kurd Şêx rîza Talebani jiyana xwe ji dest da 13 Çile 1910

Komara Kurdistan A Mahabadê ji aliyê rejîma îranê ve hate hilweşandin. 17 Rêbendan 1946

Qetliama Koçgiriye pêk hat 17 Çile 1922

Şerê kendavê a yekem destpêkir 17 Çile 1991

Avabûna Komara Kurdistan Li Mahabadê hate îlan kirin. 22 Rêbendan 1946

## Kedkarên seksê sendîka ava kirin

Li Japonaya yê konsomartîsên ku li klûbên şevê yê bi navê “kyabakura” de bi pereyan daxwaza kirînerên mêr tînin cih sendîka ava kirin. Jinên ku diyar kirin ku di bin şertên dijwar de dixebitîn û her bi tacize re rû bi rû diminin, heftêya borê serî li Wezareta Tenduristiyê dan û sendîkaya xwe ava kirin.

Konsomatrisên ku diyar kirin ku zêdetir karsaz li hemberî wan xirab tevdişerin. Wan eşkere kir ku di klûban de ku zêdetir bi mafyaya japon yakuzaya ve girêdayî ne de bi îdiaya ew kincên xirab li xwe dikin, bi mêvanan re başeber nadin her cezaya pereyan li wan tê birin, bi vî awayî jin deyndar tene derxistin û loma belaş tene xebitandin.



**Yekem û yekane weşana nûçeyî a Kurdî ya mûzîka Kurdî**  
nûçe, albûmên nû, lîste, agahî, klîp, jiyanname, gotar



**Di KURDO de her tişt li ber destê te ye...**  
► Bitiqîne

**Ev der tîrî te ye...**  
Ename, sohbet, listik nûçe, video, kîf, agahî, rewşa hewa, servisên cûda û zêdetir...

# Ji bo reklama îlanên we

Hûn dikarin di Pêşketin, HAWAR NET.com an jî weşanên din ên koma HAWAR de reklama û îlanên xwe bi nirxa herî guncaw biweşînin.

têkîlî agahi@hawarnet.com